

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal: 1982

hejmar: 5



## SAL Û DEMSAL

Di salekê de çar demsal hene. Ev jî ZIVISTAN, BIHAR, HAVÎN û PAYÎZ in.

Çawan ku her mirovek xwedî xûyekî ye, wisan jî her demsalek xwedî xûy û xisûsiyetekî ye. Em xûy û xisûsiyetên van her çar demsalan li Kurdistanê jî dibînin. Lê, xûy û xisûsiyetên demsalan li her derên Kurdistanê ne wek hev in. Ew ji cîh heta bi cîh têñ guhartinê.

### ZIVISTAN



Di salê de, demsala herî dijwar, kul û kovandar zivistan e. Zivistan demsala berf û bagerê, sur û sermê ye. Berf di vê demsalê de rûyê erdê û serêñ çiyayêñ Kurdistanê radipêçin. Her derêñ

welêt çîl-qerqaş dibin. Riyêñ gund û bajaran he  
mû têñ girtinê. Ji ber ku çavêñ koledarêñ me  
hertim li mêtina dewlemendiyêñ welatê me bûne,  
ji me re tu rê jî çênekirine. Riyêñ ku çêkirine  
jî, piranî ji bo armancêñ leşkerî ne. Heke ge-  
lên me rojekê serê xwe hildin û bixwazin bibin  
xwediyêñ welatê xwe, dewleta xwe ya karker û gun  
diyan ava bikin, dê koledarêñ me û hevalbendêñ  
wan, van riyan bi kar bînin. Leşker, tank û to-  
pêñ xwe di van riyan de biguhêzin û bînin ser  
gelên me, da ku careke din bindest bikin...

Li cîhêñ ku berf têt, boblatêñ mezin têñ serêñ  
şeniyêñ wan deran. Xela û birçibûn peyde dibin.  
Mirov û heywan qir dibin. Ji ber ku rê girtî ne,  
çûnûhatin jî dijwar dibin. Kes nikare nexwesê  
xwe bibe ser doxtoran. Ji xwe, ji destê tunebû-  
nê, kes nawêre ku here ser doxtoran da ku derdê  
xwe bide derman kirin. Di gel vê, kul û kovana  
sermê jî ne hindik e. Pir caran mirov ji sermê  
diqerisin û dimirin. Serma nemaze dijminê zaro-  
kan e û serê pir zarokan dixwe. Ba û bager pir  
kesan difetisînin. Gundî ji bo xwedîkirina hey-  
wanêñ navmalê pir xeman dixwin. Sala ku êmê hey-  
wanan kêm be, hem gundi û hem jî heywanêñ wan  
pir perişan dibin. Gundî stûxwar û şerpeze di-  
bin. Selef xwar û miftexwarêñ bêrûmet malikê li  
gundiyan dişewitînin...

Lê belê, çawan ku payîzê serê xwe ji zivistanê

re çemand, dê koledar, selefxwar û miftexwarêñ peyayêñ zordaran jî rojekê serêñ xwe ji belengaz û tängezarêñ gelêñ me re biçemînin.

## BIHAR



Bi dû dawîhatina zivistanê re bihar dest pê dike. Demsala biharê, li ba me Kurdan, xwedî cîhekî berbiçav e. Cêjna me ya NEWROZÊ mizgîniya hatina biharê dide me. Ew mizgîniya dawîhatina sur û sermê, rojêñ kurt û şevêñ dirêj yêñ reş dide. Di gel vê jî, em bi cêjna Newrozê re, rabûna ge lê xwe ya li hember zorkerî û xwînrêjiyê didin bîra xwe. Serketina gelê xwe pîroz dikan. Bi bîr anîna vê qewmandinê re, ji bo jîna me, derî û hê

viyeke nû vedibe û pêşde têt. Em bi hêviyeke xurt û têrbawer xwe diavêjin nav bizav û kefteleftekê.

Çawan ku mirov bi xwe dikeve nav keftelefteke nû, wisan jî tebiêt dikeve nav guhirîn û bizave ke nû. Berfa ku barî ye, hêdî hêdî dibuhuje. Belikî dikeve rûyê erdê. Reşayiya ku ji bin berfê derdikeve, sînga xwe ji her texlît gul, gîha, ku lîlk, gulçîçek û hêşinahiyê re pêşkêş dike. Dar û dehlên ku ji sermê behra xwe wergirtine, dibiş kîvin û aj didin. Rûyê erdê gelekî xweş û ges dibe. Bêhna curbecur ya gul û gihayên rengareng hawîrdor radipêçin. Tebiêt gelekî spehî û fodil dibe. Ew dibe weke qîzeke di çax û benda xwe de, bi xeml û xêza diwanzdeh bûkan xemilandî. Di nav kulîlkên berfê, sosin, qurnifîl û hemû hêşinahi yêñ biharê de kulîlkên nîsanê bi nav û deng in. Tevî vê jî, hevalbendiyekе welê di nav van ku lîlkan de heye, ku mirov lê ecêbmayî dimîne. Ew milên xwe didin milên hev, yek di ber yekê de, çiyayêñ Kurdistanê sor dixemilînin. Bi bêhnêñ xwe yêñ wek misk û ember, li Kurdistanê hekimiyê dîkin. Gelek nexweşîyan sivik û gelek ne-xweşan jî rehet dîkin.

Bihar bi hêşinahiyêñ xwe yêñ ku têñ xwarinê ve jî bi nav û deng e. Şeniyêñ welatê me ji xwari-na xîlok, pîvok, kereng, îsk, siping, rîwas, çex-şûr, mendik, û hwd. gelekî hez dîkin.

Li deverên ku koçer lê hene, bi xweşbûna dinya-yê re, kar û tevdîra xwe dikin, da ku derkevin zozanan. Herweha, gundiyên welêt yêñ xwedî erd, zevî, cot û cobar dest bi cot û çandiniya xwe dikin.

## HAVÎN



Havîn demsala germê, xêr û bêrê ye. Havîna wela tê me jî wek demsala zivistanê, ji cîh heta bi cîh, tête guhartin. Li cîhêñ ji rûyê behrê bi-lind, ba û hewa ne hinde germ in. Lê li cîhêñ nizim gelekî germ in. Li deverên holê, carina mirov ji germê dibehicin jî. Bê guman, heçî gundi yêñ me yêñ bê erd û zevî ne, havîn ji wan re ji her aliyî de mîna dojehekê ye. Ji ber ku gundi yêñ welê belengaz neçar in, ku ji kesên axe, xwe

dî erd û zevî re paletiyê bikin, da ku abûra xwe ya salê bi dest bixin. Heçî axe ne, dijminê keda destên pale û gundiyan in. Ew, pale û gun-diyan di wê tav û tavistanê de, ji berbanga si bê heta bi êvarê dereng, bi rojmizeke (yewmiye) kêm wek kole dixebeitînin. Destmiza wan dixwin û xwêdana wan vedixwin. Hin pale û gundi jî, ji ber tunebûna kar, diçin bajarêñ mezin û li wan deran keda destên xwe ji bo çend mehan difroşin, da ku pê debara mal,zar û zêçêñ xwe bikin. Lê heçî dewlemend û maldar in, bi perêñ ku ji stûyêñ pale, gundi û karkerêñ Kurdistanê qezenc kirine ve, di peravêñ behran û havîngehêñ behis tîn de dimezêxin. Pê kêf û şahiyê dikan û radi-bihurînin...

Gundiyêñ welêt di havînê de zadêñ xwe didirûn û bêderêñ xwe datînin. Gîhayêñ di mîrg û çîmanan de didirûn, dikan lod û ji heywanêñ xwe yêñ nay malê re hiltînin. Koçer li zozanan rûn, penîr, toraq(çolik,lor), keşk(çortan) û hwd. çêdikin û ji hirî û kejan tiştêñ lixwekirinê û raxistinê dihûnin û çêdikin...

Tebîet, nemaze di havînê de sînga xwe vedike, hemû hebûn, xêr û bêrêñ xwe pêşkêş dike. Di vê dem salê de fêkî û mîweyêñ tamdar û rengareng mişe ne. Wek: Ajik,mişmiş,behîv,alûçe,zerdele,hêjîr, hinar,tirî,sêv,hirmî,xox,helalûk(incas),tû,fiş-ne,bîhok,gêlaz(qeresî),guhîj û hwd. Herweha, seb

ze û hêşînahiyêن curbecur jî mişe ne. Wek: Pin-car,bacanên reş,şamik(bacanên sor,fireng, bamî-dor,tomatêz),îsot,baqdenûs,lobî(fasûlî),kundir,zebeş(şûtî),petêx(qawin),tivir,şêlim,gêzer,xes,kelem(lehane,nane),kartol(qompir,patatêz),îspanax,pîvaz,xeyar,ecûr,tirozî û hwd. Di gel van jî, berên daran yên wek: gûz,zeytûn,şîlan, bin-deq,fistiq,kezwan(şînok) û hwd. jî gelek in.

Gava ku hêdî hêdî havîn ber bi dawiya xwe têt û payîz dest pê dike, şenî kar û tevdîra xwe ya ji bo zivistanê dikan. Qût,êm û zexîrên xwe hel digirin. Xwe ji bo rojêñ teng û tengasiyê hazir dikan.

## PAYÎZ



Di payîzê de, êdî hêdî hêdî germa havînê dişkê. Baran peşkên xwe di ser rûyê erdê de direşîne û wê av dide. Hin ji hêşînahî û sebzêن bostanan, fê kî û mîweyêن daran çêtir distewin. Bi avî, tamdar û xwestir dibin.

Gundî arvanêن xwe dibin êş, savar û hûrikêن xwe dihêrin. Danêن xwe dikutin û heldigirin. Hinek ji zadêن xwe dikan çalan û hinek jê ji dibin ba jêr û difroşin. Pê deynêن xwe didin. Hûrûmûrêن hewce ji malêن xwe re dikirin. Koçer ji hêdî hêdî ji zozanan dadikevin û koçî wargehêن xwe yên zivistanê dikan. Ew ji kedêن xwe yên ku wan ji koçeriyyê bi dest xistine, tînin bajêr û difroşin, da ku ji xwe re tiştêن hewce pê bikirin. Çi koçer bin û ci ji gundî bin, di vê demsalê de dikevin destêن bazirgan û selefxwerêن xwînmêj û çavbircî. Bi destêن van celeb kesan û herweha, bi destêن dar û dezgehêن dewleta koledar û kedxwar têن "rûçikandinê"...

Heçî tebîet e, ew ji hêdî hêdî bedewiya xwe win da dike. Xeml û xêza gul û gîhayêن rengîn û bîn dar diçilmisin. Dar û dehlêن rengareng rewşa xwe ya fodil winda dikan. Bi awakî xemgîn û dil birîn belgêن(pelêن) xwe diweşînin. Dema xizanî û stûxwariyyê ji nû ve dest pê dike. Lê belê, wek mirovêن ku li ser sînga wê dijîn, ew ji her bi hêvî ye. Bi hêviya çêjîna bextewariya rojêن pêş û jîneke ges, rûken û serbilind e...

Xemilandî me seranser dezgirtiya xorta me;  
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me.  
Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistanâ Kurda me.  
Bê tang û top û leşker, iro we ez berdame.

*Cegerxwîn*



# NAVÊN HIN HEYWANÊN NE KEDÎ



BERAZ (xinzîr, Wehş, Donxiz,  
Guhbel, Heram)

BAV : Yekane, êkane, berazê nêr

DÊ : Mehû, manqîş, beraza mê

ZAROK : Xûzik, kudik, têşk, çêl




## GUR

BAV : Gur

DÊ : Dêlegur

ZAROK : Cewrik, çêli, çêlik



KÊROŞK (Kêrguh, Kêrwîşk,  
Kervoşk, Kerguh)

BAV : Kêroşkê nêr

DÊ : Kêroşka mê

ZAROK : Xirniyeq, xirneq, çêl




## ROVÎ (Rûvî, Rêvî)

BAV : Roviyê nêr, rovî

DÊ : Roviya mê, dêlerovî

ZAROK : Çêli, çêl, çêlik, kûçik



## HIRÇ

BAV : Hirçê nêr, hirç

DÊ : Hirça mê, dêlehirç

ZAROK : Kudik

M I J Ú L Í

DI BEXÇA HEYWANAN DE



Sengo duh çûbû bexça heywanan. Wî li wê heywanek dîtibû û gelekî jê hez kiribû. Gelô ew çi heywan bû ? Heke tu hejmaran yeko-yeko bigihînî hev, dê tu bizanibî ku çi heywan bû. Lê ji hejmara 1-ê dest pê bike û li gor rêsê heta bi 37 an here !

## VEJANDINA ZIMANÊ KURDİ

Me di hejmara 4 an de navêن hin curêن (texlît, celeb) sêv û hêjîran nivîsandibûn. Di vê hejmarê de jî, em ê navêن hin curêن hirmî, kundir û tûyan binivîsin.

Lê belê em bawer in, ku hin curêن din jî hene, ku me nenivîsandine. Yan jî, hin ji van navêن jêrîn wek hev in. Ji ber vê yekê, heke hun bizezanin ku hin ji van navan wek hev in, yan jî hin curêن din yêن me nenivîsandî hene, ji keremên xwe re, me agehdar bikin. Wan ji me re bi nivîsin û rêbikin, da ku em wan çap û belav bi kin. Herweha, em ji we hêvî dikan, ku hun navêن curêن tiştêن din jî ji me re binivîsin û bişînin. Em ê bi vê riyê zimanê xwe bidin vejandin, wî pêşdetir bibin û bi ser de jî, hin gotinan ji windabûnê xelas bikin.

### NAVÊN CURÊN TÛYAN

- |               |                |
|---------------|----------------|
| 1- Reş, reşik | 8- Paloyî      |
| 2- Morî       | 9- Şekirik     |
| 3- Helebî     | 10- Birincik   |
| 4- Zer        | 11- Xumrî,sor  |
| 5- spî        | 12- Şêmî, Şamî |
| 6- Meletyê    | 13- Romî       |
| 7- Bi dendik  |                |

## NAVÊN CURÊN HIRMIYAN

- |   |                      |
|---|----------------------|
| 1- Dûsotk, dûvsorik                       | 10- Reşik, res, reşk |
| 2- Şekoke, şekok, şikoke,<br>şeqoq, bozik | 11- Alîsor           |
| 3- Hecî Hemze                             | 12- Tomanî           |
| 4- Sor                                    | 13- Zerik            |
| 5- Malote                                 | 14- Şitû             |
| 6- Şekwîl, şewkîl                         | 15- Rêrî             |
| 7- Girsik                                 | 16- Bozik            |
| 8- Payîzî                                 |                      |
| 9- Zivistanî                              |                      |


## NAVÊN CURÊN KUNDIRAN

kundir = kudî=kundik=kundil=kulind

- |                   |  |
|-------------------|--|
| 1- Mîranî         | 13- Kundirê tirşikê                                |
| 2- Spî            | 14- Dolmik, rextik,<br>xirtik, kundirê<br>yapraxan |
| 3- Botanî         |  |
| 4- Şamî           |  |
| 5- Qirikdirêj     |  |
| 6- Kûse           |  |
| 7- Hestî          |  |
| 8- Sîlehî         |  |
| 9- Kafirî         |  |
| 10- Serşokê       |  |
| 11- Pênctilî      |  |
| 12- Kundirê afikê |  |

# M I J Ü L İ

## CEHSİKA GİRƏDAYI



Cehşika jorîn bi singekî ve hatiye girêdan.  
Gelo bi kîjanî ve ?

Derman tune bona xema gir,  
Dil min dişewite bê agir.

*Üsivê BEKO*



# PEYVÊN BERVAJIYÊN HEV

<u>PEYY</u>	<u>BERVAJÎ</u>
dê	bav
gundi	bajarî
çiyayî	deştî
gund	bajar
şer	aştî
siwarî	peya, piyade
lez	hêdî
zû	dereng
ken	girî
dijmin	dost, yar
xwîşk, xweng, xweh	bira
jîr	zexel, teral
xwîngerm	xwînsar
nêzîk	dûr
pêşeroj	paşeroj
pêşverû	paşverû
xuya	nependî
eşkere, vekirî	veşartî, dizî
vekirî	girtî
serbest	qedexe
nêr	mê
serdest	bindest
gerdenxwar	gerdenazad
qencî	xirabî
qenc	pîs, neqenc
dapîr	bapîr
kalik	pîrik

# M I J Ü L İ



Gelo navê wî mîrikî ci ye ?

Tîpêñ ku navê wî jê pêk têñ, li ser çav û rû-yê wî belavkirî ne. Heke tu wan tîpan bigihî-nî hev û lê bixebitî, dê tu navê wî derbixî.

NÊÇÎRVAN  
ÇÎROKEKE KURDÎ

Rojekê, hirç, rovî, dîk, mirîşk bi kevokê ve diçin şikeftekê, pev re diaxêvin û ji hev re dibêjin "em ê bibin destbirayên hev." Hemî qîma xwe pê tînin.

Pey vê yekê, hirç dibêje rovî:

- Bira, ez birçî me, dermanekî bike.

Rovî dibêje:

- Ez rovî me,

Siyarekî çilapî me,

Nayême xwarin.




Hirç ji dîk dipirse û dibêje:

- Dermanê me nabe, em ê çawan bikin ?


Dîk dibêje:

- Ez dîk im,  
Li ser kundir im,  
Nayême xwarin.



Hirç îcar dibêje mirîşkê:

- Lê, em çawan bikin ?



Mirişk dibêje:

- Ez mirîşk im,  
Nan û hevrîşk im,  
Nayême xwarin.

Hirç paşê dibêje kevokê:

- De, tu bêje !..

Kevok lê vedigerîne û dibêje:



- Ez kevok im,

Kew im, nan û dew im,

Nayême xwarin.

Piştî axaftina kevokê, hemî li hirçê dinêrin.

Hirç dibêje:

- Çire hun li min dinêrin ?



Ez hirç im,

Tevde pirç im,

Nayême xwarin.

Wextek dibore. Kes devê xwe venake. Hemî mitalan dikan. Rovî ji hirçê re dibêje:

- Bira, te qet nan û dew xwarine ?

Hirç dibêje:

- No...

Rovî:

- Ay, mala te ava be, ma ji nan û dew xweştir hene ?

Herdu dest pê dikan kevokê dixwin.

Hirç piştî xwarina kevokê dibêje rovî:

- Bira, ez birçî me!..

- Bira, te qet nan û hevrîşk xwarine ?

- No...

- Mala te ava be, weke nan û hevrîşk xweştir tune.

Ew digihêjin mirîşkê wê jî dixwin.

Hirç dîsan dibêje:

- Lanet li vî halî, lê bira rastiyê bêje, ma em ne birçî ne ?

Rovî serê xwe dihejîne û dibêje:

- Bira, te hîç nan û kundir xwarine ?

Hirç lê vedigerîne:

- No...

- Wa, mala te ava be, ji kundir xweştir qet bawer mekî ku tiştekî çêtir di dinyayê de hebe.

Ew radibin dîk jî dixwin.

Êdî, bi tenê hirç û rovî dimînin. Hirç dibêje rovî:

- Bira, ez tî me, ez çawan tî me!..

Rovî lê vedigerîne:

- Bira, av heye, lê heqê wê çavek e. Herge tu çavekî bidî, dê avê bidin, herge na, nadîn.

Hirç gelek difikire, lê gava dibîne ku çare nabe, çavekî xwe dide rovî, da ku ew avê bîne.

Rovî diçe şerbikek av tîne û tê. Hirç bi vê şerbikê têr nabe, dibêje rovî:

- Bira, ez tî me, ez ecêb tî me, bira ez ê çawan bikim ?

Rovî lê vedigerîne:

- Çavê din jî bide, da ku têra xwe avê vexwî, an na, bê çav avê nadîn.

Hirç çavê xwe yê din jî derdixe û dide rovî.  
Rovî diçe, şerbiikeke din av tîne û jê re dide.

Hirç, vê derbê jî tî dimîne, têr av venexwariye û dibêje rovî:

- Bira, ez tî me!..

Rovî lê vedigerîne:

- Bira, derman nîne, bide pey min, were. Heye ku gava xelk te bibînin ku tu kor î, li te bêñ rehmê û avê bidine te.

Rovî dide pêşiyê, hirç dide pey, herdu dikevin rê. Rovî bi fen bû, rê zanîbû, lê hirç kor bû, rênezan bû. Rovî çû ser serê zinarekî, sekînî û di reya zinêr de hêdîka daket û gazî hirçê kir:

- Lê, hirçê, rast bi rast li pey min were!..

Hirçê pirsî:

- Bira, rê rast e ?

Rovî lê vegerand:

- Rast e, metirse, bimeşe!..

Wexta hirç giha serê zinêr û peyê xwe avêt da ku pêş ve here, di zinêr de belabela bû, çû, ge-ver(mirar) bû.



Rovî lê vegeriya da ku godtê wê bixwe. Wî devê xwe avêt hêta wê, lê hema vê çaxê nêçîrvanek lê der hat. Rovî kir bireve, lê êdî wext dereng bû, tîra nêçîrvan ew wergerand ser kîlekê, rovî li rex hirçê dirêj bû. Nêçîrvan gihaşte wan, zikê herdiwan qelaştin, dîk, mirîşk û kevok saxe-sax ji zikên hirç û rovî derxistin. Her sê gelék şâ bûn û êdî neçûn çolê. Nêçîrvan jî, ji vê rojê bi şûn de mirîşk, dîk û kevok hînî xwe kîrin û ew her sê heywan bûn heywanêñ kedî.

Kamûran BEDIRXAN



# M I J Ü L İ

SES LEPIKÊN WEK HEV



Na, ne rast e. Her şes ji ne wek hev in. Ferek ji  
wan ji yêñ din cihêtir e. Gelo kîjan e ?

MILÊ XWE  
BIDE MILÊ MIN

Allegretto

Notenivis: Cemîla CELİ



Milê xwe bide milê min, kuro,  
Qam qudûmên çökên min.

Ez hatim aliyê we de, kuro,  
Milê xwe bide milê min.

Ez hatim aliyê we de,  
Qam qudûmên çökên min.

Ha sibe ye, sibe nabe, kuro,  
Milê xwe bide milê min.

Ha sibe ye, sibe nabe, gede,  
Qam qudûmên çökên min.

Zerî raza ranabe, kuro,  
Milê xwe bide milê min.


Zerî raza ranabe, gede,  
Qam qudûmên çökên min.

Ser sîngê zer vedaye, kuro,  
Milê xwe bide milê min.

Ser sîngê zer vedaye, gede,  
Qam qudûmên çökên min.

M I J Û L Î

BENDÊ NEGİRÊDAYÎ



Sê zarok bi balafirên derewîn ve dilîzin. Lê belê bi tenê bendê yekî ji wan bi balafira derewîn ve girêdayî ye. Gelo kîjan e ?

Bi wan kofiyên rengsorgulî,  
Qet çi hebûn perdekirî,  
Horî hebûn rind û melûl,  
Yan hêşirêd zencirkirî ?

1934

*Nûriyê HIZANÎ*



## KULÎLK

Mizgînî hat mizgînî,  
Derket Kulîlka zêrîn,  
Bi xêr hat, xweş pîroz be,  
Derman dike ew birîn.

Kulîlk vebû li darê,  
Jê tê bîna biharê,  
Sorgula zarokên me,  
Wek Newroza Adarê.

Kulîlk sêva li darê,  
Bo zarok, xort û kalê,  
Em gelek serbilind in,  
Bi vê pirtûka hanê.

Gava mirov dixwîne,  
Vê Kulîlka pelzêrîn,  
Mirov evîndar dike,  
Wek Memo û weke Zîn.











Zarokno xweş bixwînin,  
Bi zimanê xwe yê xweş,  
Ev diyarî bo we ye,  
Divê ji dest nexînin.

Zarokno ji wer pîroz,  
Mezinno ji wer pîroz,  
Divê xwe winda nekin,  
Wek Birîndar li ser soz.

BIRÎNDAR

4. 12. 1981

XACEPIRS



## RÊZIMAN Û RASTNIVÎSANDINA KURDİ

Dûmahiîka hej. 4

Wek me di hejmara 3 an de jê kad kiribû, çar tex  
lît navdêrên din jî hene. Ew jî evêñ jêrîn in.

### NAVDERÊN BERBIÇAV

(Konkreta substantiv - Konkreta Substantiv -  
*Concret nouns*)

Em ji navdêrên ku bi destan têñ girtin û seh ki  
rin û bi çavan têñ dîtin re navdêrên berbiçav  
dibêjin. Wek: Pisîk, xanî, sêv, bajar, deşt,ço,  
derî, kûze, çiya, gul û hwd. Gava em pisîk di-  
bêjin, em wê heywanê bi navdêreke berbiçav ve  
salix didin. Ji ber ku em dikarin wê bibînin û  
bi destêñ xwe ve bigirin û seh bikin. Herweha ço  
û hwd jî. Heçî navdêrên wek bajar, deşt û hp.  
(heta paşîn) ne, herçendî bi dest neyêñ girtinê  
jî, lê belê bi çavan têñ dîtinê. Ji lew re, ew  
jî navdêrên berbiçav in.

### NAVDÊRÊN NEBERBIÇAV

(Abstrakta substantiv - Abstrakta Substantiv -  
*Abstract nouns*)

Heçî ev navdêr in, ne bi destan têñ girtin û ne  
jî bi çavan têñ dîtinê. Wek: Hevalti, bindestî,  
belengazi, mîranî, jîn, sersal, meh, roj, ciwa-  
nî û hwd. Gava em hevalti dibêjin, em wê bûyer  
û qewmandinê bi navdêreke neberbiçav ve salix

didin. Ji ber ku em nikarin wê bibînin û bi des têx we ve bigirin û seh bikin. Herweha meh, ser sal, ciwanî û hp. jî. Ji lew re, em ji wan re navdêrên neberbiçav dibêjin.

### PIRENAV

(Kollektiva substantiv - Kollektiva Substantiv-  
*Collective nouns*)

Pirenav yan jî komnav ji navdêrên ku komekê bi me nîşan didin re têx gotin. Wek: Gel, komele, civat, daristan, rêl, rivd, tof, encumen, meclîs û hwd. Gava em daristan dibêjin, em devereke ku her texlît dar lê hene û dar lê mişe ne, bi navdêreke pirenav(komnav) ve salix didin. Navdêra komele jî yek ji van navdêran e. Ew civatek e, ku tê de kesên curbecur endam in û ji bo arman-ceke xuyakirî dixebeitin.

### GEWHERNAV

(Ämnesnamn - Stoffname - *Subject nouns*)

Gewhernav ji navdêrên ku gewherekê yan jî tiştekî ku mirov pê tiştina çêdike re dibêjin. Wek: Zêr, zîv, hesin, dar, av, hewa, gule, bafûn û hwd. Gava em zêr dibêjin, em wê gewherê bi gewhernavekê ve salix didin. Em dizanin ku zêr gewherek e, ku mirov dikare bi wê xemlan çêbike û tiştan bixemilîne. Herweha, hesin jî gewherek e ku mirov jê pir tiştan çêdike. Ji ber vê yekê, em ji navdarê holê re gewhernav dibêjin.

# WECANI IL DİN

\*ŞERÊ SERÊN GİYAN\* H.Battî

Hesin ji eskeriyê reviyayê  
Mehkûm e. Li گىyan digere.



①

Ez birqî bûme.  
Divê ez ji xwe re  
nêfrîr bikim.




②

Wey, ew kewek e.  
Bi Xwedê ez û wê  
bikujim.





③

32



④







(17)



(18)



(19)



(20)



(21)



35

(22)

BERSİVÊN PIRSÊN HEJMARA ÇARAN YA KULÎLKÊ


MIJÜLÎ - rûpel: 16

BERSIV : SOSIN

XACEPIRS - rûpel: 31

BERSIV :

XACEPIRS





PRIS : 10:- skr  
BIHA

## LERZO

Moderato

Notenivis: Cemîla CELÎL



Lerzo qîza hedada bî,  
Hay, hay Lerzo, medet Lerzo.

Lerzo qîza hedada bî,  
Wîş-wîş Lerzo, medet Lerzo.

Rûnişt biskên xwe badan,  
Hay, hay Lerzo, medet Lerzo.

Rabû çavêن xwe kil dan,  
Wîş-wîş Lerzo, medet Lerzo.

Ramûsana xwe derda,  
Hay, hay Lerzo, medet Lerzo.

UTGIVARE  
KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING  
WEŞANA KOÇ - KAK  
KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN  
BOX 7031  
163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM  
SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0